

KEPİR

Kovareka heyvane ye bo zarokan Dezgeha
Spîrêz bi harikariya Dîyakonya li Duhokê
derdiket.

Jimare
45

Adar
2007

Xwedan imtiyaz : Dezgeha Spîrêz

Peyva Kepir

Sernîviser
Mueyyed Teyîb

Nîgar
Necmeddîn Bîrî

Derhênan
Beyar Cemîl
Necmeddîn Bîrî

Tîpçînîn
Mesûd Giravî

Adar heyva kurdan e, ji ber ku ji hemû heyva pitir şadî û şînyên me tê de hene. Di adarê de newroz heye. Newroz destpêka buharê û sersala me ye. Newroz - di şevên tarî de- Herdem xefîreka geş bûye rêka serkeftinê li ber me ronî kirî ye. Newrozê di rojên giran de herdem dilê me bi hêviya geş û avakirî ye. Di adarê de, Barzaniyê nemir ji dayik-bûye. Barzaniyê nemir hemû dîroka me ya nû ye. Dîroka me ji dastaneka dirêj e ji serhildanê dijî sîtem û zordariyê.

Di adarê da, Helebçe şehîd bûye. Helebçe ji mezintirîn karesat û dirîndetirîn tawane di dûmahîya sedsalîya borî de rû daye. Di adarê da, yek ji mezintirîn serhildanên gelê me di dîrokê da rû daye.

Her di adarê jî de reva reş bi ser gelê me de hatî ye ku bi rastî firajedyekê bê wêne bû di dîroka nû ya mirovatîyê de.

Ji ber vê hemiyê, em her sal bi hestên cuda, cuda pêşwazîya rojên adarê dikin. Em şehîd û lehengên xwe bi bîr dihînin û bi bîranînan wan em soz û wefadariya xwe nû dikin. Lê em şahî û seyranên xwe jî digêrin û bi gêrana wan şahîyan em hêza xwe jî bo azadî û jîyanê diyar dikin û destê dostaniyê dirêjî hemû gelên cihanê dikin.

Adar û newroza me pîroz be û her bîjî aşîfî, azadî û dostaniya gelan.

Duhok-Avahiya Sendîka Kargerên Kurdistanê-Qatê sêyem

Telefon:0096462 722 21 25-722 53 76

E-Mail:kepir@spirez.org

Çapxaneyê Xanî - Tîraj: 2000